



Miştêfa Hicrî: Rojava li ser guhertina rejîmekê rişd e ku guhertinan li xwe nagire

»»» R:3



Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdiştana Îranê daxûyanîyek belav kir

ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

»»» R:6

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (354) 22-07-2019 Buha (1000) Tûmen

Bi derbasbûna demê jî rêbaza Qasimlo kevn nabe

Êdî ew nasname ye!

»»» R:2



Heyeteke Hizba Demokrat serdana Wezaretê Derve a Biljîkê kir



Heyeteke Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê, bi serpereştiya lêpirsiyarê giştî yê PDKÎ, serdana Wezaretê Derve a Biljîkê û parlemena Fedral a wî welatî kir.


Roja Çarşemî 19'ê Pûşperê, li Çarçoveya kar û çalakiyên taybet bi bîranîna 30 saliya "terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî", heyeteke PDKÎ, bi serpereştiya lêpirsiyarê giştî yê Hizba Demokrat, serdana Wezaretê Derve a Biljîkê û parlemena Fedral a wî welatî kir.

Sibêdeya roja Çarşemî, heyeta Hizba Demokrat, destpêkê bo hevdîtina digel berpîrsê karûbarên Îranê di Wezaretê Derve ya Biljîkê de, serdana Wezaretê Derve ya wî welatî kir, û digel navbirê mijareke taybet bi bîranîna 30 saliya terorkirina rêberê Kurd Dr. Qasimlo û hevalê wî behs kir, û di heman demê de bas ji mijareke hewce li ser Rojhilata Kurdiştanê kir.

Di wê hevdîtînê de, lêpirsiyarê giştî ê Hizba Demokrat, bi hûrî li ser rewş û siyasetên Komara Îslamî axivî, û piştî siyaset û nêrînên Hizba Demokrat bi hûrî anîne ber bas.

Piştînivroya wê rojê, heyeta Hizba Demokrat, bi serpereştiya lêpirsiyarê giştî, serdana parlemena Fîderal a Biljîkê kir. Di wê serdanê de jî basa doza Kurd, bîranîna 30' emîn sala şehîdên Viyênê û siyaset û nerîna hizba Demokrat, hate kirin.

Di wê çarçoveyê de, bi serpereştiya endamekî parlemena Fedral a Beljîkê bi navê "Tîm Wandênpût", civînek pêk hat. Destpêka civînê, lêpirsiyarê giştî ê Hizba Demokrat, mijara xwe pêşkêş kir, û piştî bi pirsîyar û bersivê, civîn dawî pê hat.



Bi derbasbûna demê jî rêbaza Qasimlo kevn nabe

Sergotar

Êdî ew nasname ye!

N: Kerîm Perwîzî

Dr. Qasimlo rêberê tevgerêke netewî û demokratîk bû ku dehan salan li dijî her du deşhilatên paşatî û Wîlayeta Feqîh xebat kir. Wê tevgerê ji serhildanê heya rabûna ser piyan, ajarvedan û pişt re jî heya mezinbûn û berfirehbûnê, herwisa dema veqetiyên û şikestan û di dema paşvekişîn û pêşketinan de gelek ezmûn bi deşt xwe ve anîn ku pareke zêde ji wan deştkeftan di dema Pêşewayê nemir de hatibûn bi deştixistin. Lê berdewamkirina vê rêbazê, vejandin, berhevkirina dubare a rêbazê, rêkxistina dubare, modernîzekirin, demokratîzekirin û geşepêdana dubare a vê rêbazê di stûyê Dr. Qasimlo de bû. Ew bi raman, hizr, xebat û xwîna xwe heya hertim bû darê berûyê ê mayînde û li ser piyan ku ti bahozeke nikare bandorê bike ser rihên wî darî.

Dr. Qasimlo bi awayekî av daye darê berûyê ê şoreşa nîştimana me Kurdiştanê û dar heres kir û pişt re wî darî ajar veda, ku Kurd di bin siya wî darî de bêhna xwe vedidin. Herwisa ew dar bûye hêma û handerê neteweyên din li Îranê. Bi taybetî azadîxwazên rastîn li wî welatî, wî hertim weke çavkaniya perwerde û handanê dibînin.

Deşhilata Komara Îslamî di Pûşpera xembar a sala 1368'an de dixwaşt bi teqekirin li mejiyê tevgera netewî û demokratîk a Kurdiştanê, vê tevgerê tûşî feleca hizr û mejî bike. Rejîmê dixwaşt bi vî awayî laşê bê ser ê vê tevgerê bike sotemeniya xwestekên xwe ên gemar û kirêgirtiyên xwe ên deştikird. Lê nedizanî ku Dr. Qasimlo, darê berûyê ê şoreşa Kurdiştanê ye û êdî bi rihên dîroka Kurdiştanê ve hatiye girêdan. Tenê hin kadir û pêşmerge li derdora Qasimlo nîn in, lê belê tev dar û

Heyeteke Hizba Demokrat, serdana Parlemana Yekîtiya Ewropayê kir



Li berdewamiya kar û çalakiyên taybet bi bîranîna 30 saliya terorkirina duktur Qasimlo û hewalên wî, heyeteke PDKÎ, bi serpereştiya Lêpirsiyarê giştî ê PDKÎ “Mîstefa Hicrî”, serdana Yekîtiya Ewropayê kir.

Roja Sêşemî 18ê Pûşpera 1398an (9ê Tîrmeha 2019an), her li Çarçêweya kar û çalakiyên taybet bi bîranîna 30 saliya terorkirina duktur Qasimlo û hewalên wî, heyeteke PDKÎ, bi serpereştiya Lêpirsiyarê giştî ê PDKÎ “Mîstefa Hicrî”, serdana Yekîtiya Ewropayê kir.

Heyta Hizbê, ji aliyê “Ralif Bançês”, serokê Saziya UNPO û endamên din ên deştaya sekertariya wî Saziye, û hey' tek li endamên Yekîtiya ewropayê bi ser-

pereştiya “Julî Ward” endamê parlemana Yekîtiya Ewropayê li firaksiyona “Sosyal Demokrat” bi germî hatine pêşvazîkirin.

Despêka dîdarê “Elî Eb-dîlzade” basa dîroka Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê kir.

Pişt re “Mîstefa Hicrî” kurte basek li ser dîroka xebata Kurd li Kurdiştana Îranê kir.

“Mîstefa Hicrî” basa tepe-sekirina neteweya Kurd kir, ku ji aliyê deşthelatdarên cuda li berdewamiya dîrokê di Îranê de û bitaybet di heyama Çar dehikên derbasbûyî de kir û got: “Gelê Kurd di bersiva daxwazkariyên despêkî ên mafên mirovî û neteweya xwe de, ji aliyê rejîma Îranê ve bi awayekî

dirindane tene serkotkirin û terorkirin û deştaseser kirin.

Lêpirsiyarê giştî ê Hizba Demokrat îşare bi vê yekê kir ku, hewlên welatên Ewropayî bo guherîna reftarên rejîma Îranê bê encam bûn, û di bîngehê de ew rejîme îmkana guherîna erênî tê de tunine.

Pişt re çend pirsyarên parlamntaran ji aliyê Lêpirsiyarê giştî ve hate bersiv dan.

Di parek din a wê civînê de, “Dr. Îdrîs Ehmedî”, beseke akademîkî derheg rewşa Îran û Rojhilata Navîn pêşkêş kir.

Di dawiya wê civînê de, “Teymûr Elyasî”, serokê Saziya mafê mirov ê Kurdiştanê, komek sebeb derheq bi binopêkirina mafê mirov li Kurdiştan û Îran bigiştî anî ber bas.

kevîrên Kurdiştanê wê bibin

neynûka rengvedan û tîrêja ronahiya hizr û manîfestooya Qasimlo.

Şoreşa nîştimanperwerî û karwanê avakerên bîngeha nîştimana nû, gav bi gav û qonax li pey qonax, bi Rasan'ê serî li waneyên Qasimlo didin. Qasimlo ji wan dîr nîn e û di odeya kar û xebata wan de, di çepera paraştinê de, bi mûzîka telefûnên wan, di naveroka pirtûkên zanîngeha wan de û bi medalya ser sîngên wan re ye.

Çiya, gelî, zozan, kolan, bazar, zanîngeh, kargeh, karwan, dar, kevir û dîwarên Kurdiştanê bi navê Qasimlo û bi bîranîna wî hatine xemilandin û xwestîrîn mûzîk piştî Ey Reqîbê li cem Kurdên welatê rojê û rojhilat, sirûda Xwedeyo Welat Ava Ke ye.

Piştî derbasbûna 30 salan di ser xedr û tawana li hemberî Kurdiştanê û Kurdan re, hêviyên dîjmin hê bicî nebûne û Qasimlo êdî tenê sekreterê partiyekê nîn e. Lê belê ew bûye nasnameya şoreşa neteweyekê û hêma û armanca pêşerojê ji bo avakerên nîştimanê.

Mîstefa Hicrî: Rojava li ser guhertina rejîmekê rijd e ku guhertinan li xwe nagire

Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi helkefta 30' emîn salvegera terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo di meşa girseyî a bajarê Broksêlê de gotarek pêşkêş kir.

Peyam wiha ye:

Mêvanên hêja, hevalên xweştirivî!

Silaveke germ li we be.

Em di van rojan de 30 saliya terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo sekreterê wê demê ê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê û hevalên wî bi bîr tînin ku roja 13'ê meha 7'an a sala 1989'an ji aliyê diplomatên terorîst ên Komara Îslamî ve li Viyenê hatin terorkirin. Em spasiya we dikin ku îro hatine vir.

Teror di demekê de hate kirin ku şandeya Kurdan li ser vexwendina rejîmê ji bo gotûbêjkirin li ser çareseriyê pirsê Kurd li Viyenê li ser maseya danûstandinê bû. Çareseriyê pirsê neteweyan û cudabîrên ku daxwaza mafên xwe ên rewşa dikin û herwisa riftar bi kesên rejîmê bixwe jî ku hinek nerîna wan bi rejîmê re cuda ye, tenê bi jinavbirina fizîkî û terorê tê bersivdan. Di vê derbarê de karnameya Komara Îslamî tijî şermezariye ku haya we jê heye. Serpêhatiya Ayetulla Şerîetmedarî, Ayetulla Muntezirî cîgirê Xumeynî, Refsencanî ku ji avakerên rejîmê û serokkomarê berê bû û serpêhatiya sedan û hezaran kesên din mînakî siyaseta vê rejîmê ye.

Me û cîhanê ev bûyer dîtin. Niha em Dr. Qasimlo û hevalên wî bi bîr tînin û rêzê ji kesatî û hizra wî a modern digirin lê ev bîranîn ne dikarin reftara rejîmê li derve biguherin û ne jî li navxweyê welat siyaseta rejîmê ber bi çaksaziyê ve dikşînin.

-Guhertina riftara rejîmê li derve, tişta ku DYA û Ewropa ji bo wê mijarê di hewlandanê de ne.

-Reforma navxweyî ku çaksaziyê li pey xwe ve bîne ku ev çend sal in reformîst li navxwe di vê pêxemê de kar dikin. Ev jî piştî û rûyê siyasetekê ne ku heya niha di xizmeta berdehamiya desthilatdariya rejîmê û handan di rijdbûnê ji bo berdehamiya siyasatên navxwe û derve ên rejîmê de ne.

Çavkaniya vê şaşiyê ev e ku heya niha Rojava, bingehên fikrî û hizrî ên vê rejîmê nas nekirine lewma jî li ser guhertina vê rejîmê ku qet jî nayê guhertin, rijd e. Êdî tiştek bi navê Komara Îslamî a ku xwe bi hin tiştan pênase dike û baweriyê wê bi wan heye, namîne. Rejîmê baş ev rastî fêm kiriye û lewma jî amade ye xercê bikşîne lê vê guhertinê qebûl nake. Heya niha jî xerxa wê daye.

Eger rojekê rejîm di encama givaşa berçav û dorpêçên Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê de bi derew qebûl bike ku ewê riftarên xwe biguhere, dema ku derfetê jê re çê bibe, wê bi awayên eşkere û veşartî, riftarên xwe ku li gor erkên olî weke henarderkirina şoreşê binav dike, berdeham bike. Bi taybet ku derew yan jî teqiyê, ne tenê di ola vê sîstemê de kirêtin e, lê belê rewşa ye. Bi xasmanî dema ku di berjewendiyê wan de û ji bo berfirehkirina hizrên wan be. Lê reform li navxwe; Ev, bi dehan salan e ku siyaseta navxwe a girûpekê bi navê Reformîst an jî Îslahxwazan e ku bixwe jî di desthilatê de bûn lê piştî re hatin piştguhixistin. Êdî wan li dewsa hewldanê ji bo gihertina rejîmê, hewl dida careke din vegerin nava desthilatê. Lewma jî di rojên tengane ên rejîmê de, xelk han didan herin ser sindûqên dengdanê û dengên xwe bidin.

Piropagandeya vê girûpê ji bo vî karî ev e ku ew îdiayê dikin ewê gav bi gav rejîmê neçar bikin paşve here û mafên binpêkirî ên xelkê bide. Bi vî awayî ew bi rengekî neraşterast ji



bo berdehambûna rejîmê, alîkariya wê dikin.

Me berî terorkirina Dr. Qasimlo û sedan azadîxwazên din ên Îranê got ku ev rejîm, guhertin, vekiribûn, dabînkirina mafên xelkê û guhertina riftara terorîstane û pawanxwazî li derve lixwe nagire. Sedemê jî şarezayîya me li ser mahiyeta vê rejîmê bû.

Niha jî piştî derbasbûna 40 salan ji temenê vê rejîmê û piştî derbasbûna 30 salan di ser terora Dr. Qasimlo û hevalên wî re, her kesê vê rastiyê dizane heya dema ku ev rejîm di desthilatê de be, ne xelkê Îranê azadî, ewlehî û jiyaneke modern dibîne û ne jî Rojhilata Navîn, aramî û aşiyê bi xwe ve dibîne. Ji ber vê jî dabînkirina van du xwestekan dimîne ser nemanê rejîmê.

Eger DYA û Ewropa jî bi rastî Îraneke aram Rojhilata Navîn a bi aşî û avedaniyê dixwazin, divê hikûmeteke demokratîk û normal, bikeve dewsa vê rejîmê. Bi vî rengî ew navçe wê bibe bazareke berfireh ji bo bazirganî û ber-

jewendiyên DYA û Ewropayê jî.

Weke Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, ji destpêka temenê rejîma Xumeynî ve bi sedan xebatkarên me rastî êrîşa terorîstên rejîmê hatine û jiyana xwe ji dest dane. Di nav wan de jî kesatiyên mezin ên weke Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî hene ku her du sekreterên giştî ên partiya me bûn. Herwisa bi hezaran kesên din ji partiyên din ên opozîsyona Îranê û kesatiyên siyasî, olî û netewî ên din jî ku ev rejîm qebûl nedikirin, hatin terorkirin yan jî hatin darvekirin. Bi hezaran kes ji girtiyên siyasî jî di salên 80 ên Zayînî de di girtîgehên rejîmê de hatin darvekirin.

Di nav van 40 salan ku pilankirina ji bo guhertina riftara rejîmê rastî şikesteke siyasî a tam hatiye, gelo dem nehatiye ji bo ku me sîstemeke demokratîk li Îranê hebe û Rojhilata Navîn jî ber bi aşî û aramiyê ve here û tev alî ji bo guhertina vê rejîmê bikevin fikra danîna pilanekê?

Peyama birêz Mîstefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ di meşa Birokselê de

Lêpirsyarê giştî ê PDKÎ di meşa Birokselê de peyamek rû li xelkê Kurdistanê belav kir. Deqa peyamê weha ye:

Kurdiştaniyên hêja, rêvîngên riya Dr. Qasimlo!

Îro em hemû li vir kom bûne, da ku rojê tal a din di dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê me de, bîr bînin. Roja 13.07.1989-an a Zayînî (22.04.1368), ku rêberê me yê şehîd, Dr. Qasimlo û hevalên wî bi hêvî û armanca çareserîya aştxwazane ya pîrs Kurd li Rojhilata Kurdistanê li ser maseya gotûbêjê digel heyeta bi nav danûştanmdînkar a rejîma terorîst a Komra Îslamî hate terorkirin.

Terorek ku li bajarê Viyenê paytexta Nemsayê, û di nava dilê Ewropaya şariştaniyê û bi nav wargehê paraştina mafê mirovan li roja ronahî de û li ber çavên xelkê cîhanê rû da, û qatil ku dîplomat-terorîstên li ser maseya gotûbêjê û şandiyê rejîma Tehranê bûn, li jêr parastina polîsê Nemsayê heya firokexanê hatin birêkirin, û bo Tehranê hatin şandin, da ku li wir bi sedema birêvebirina vê erka girîng ku bi wan hatibû spartin, bêne xelatkirin. Ewropa jî kiş û mat tenê çavlêker û bîserê vê xebera pîr ji şermezarî bû, ku di ragehandinên xwe de belav dikirin.

Lê Qasimlo çima hate terorkirin?

Qasimlo ew sîmayê neteweyî, pêşkevînxwaz û şoreşger û azadîxwaz bû ku îrojê digel de be, em wekî PDKÎ û bizava neteweyî di Rojhilata Kurdistanê de em xwe wekî rêvîngê vê riyê dizanin ku rêbaza Qasimlo bû.

Qasimlo ji me re tenê rêberê PDKÎ nebû, belku xwendîgehê bû ku di gelek warî de bandora wî li ser siyaseta xebata rizgarîxwaziya Kurd hebû. Di heman demê de ew mamostayek bû ku dersên Kurdbûnê wekî mîratekê ji

rêberên mezin ên wekî simko û pêşewa Qazî Mihemed ve gehande me, ew waneyên ku Kurdbûnê wekî nasnameyekê zeq dike û xebata bo Kurdistanê jî wekî erkeke nîştimanî û mirovî dihesibîne, lewra dema ku em bîr ji Qasimlo dikin, di raştî de wêneyê mirovekî tê ber çavên me, ku sîmayêke îroyîn û mirovtewerane ji xebat û armancên rewşa ên tevgera rizgarîxwazane a neteweya me dixê rû.

Komra Îslamî her ji dema ku hate ser kar heya îro rojê, berdewam bûye li ser kawilkarî û terorê li dijî gelê Kurd û hemû neteweyên bindest ên Îranê, û ji vê riyê ve ji tu tawanekê xemsarî nekiriye.

Xomêynî bi biryara xwe ya cîhadê li dijî gelê Kurd û tevgera Kurdan di Îranê de dest bi kar bû, û heman ferman ku piştî DAÎŞ`ê li dijî Kurdên Îzidî ragehand û cîbicî kir.

Rejîma Xomêynî di vê heyamê de hemû hewla xwe xîste ger ku bi şer û îşkenc û îdama xelkê cudahîzr di navxwe ya welat, û vegeşandina şer, çend berekiyê û neseqamgiriye di navxwe ya Rojhilata Navîn û gellek cîhanê din ên cîhanê xîmê deshîlata xwe bihêz bike, lê dijkiyara PDKÎ tenê şopandina siyasiyane û bergiriya rewşa ji pîrsê bû. Jiber ku di rojên herî dijwar ên serkutkirinê di Kurdistanê de Qasimlo em fêr kirin ku em wek Komra Îslamiya Îranê nînin ku hemû kiryarekê li dijî neyarên xwe rewşa bizanin. Di vê derheqê de bû ku qet îzin neda ku teror bi terorê were bersivandin. Heya îro rojê zêdetir ji 300 kes ji endamên PDKÎ ji aliye Komra Îslamiya Îranê ve hatine terorkirin, lê bersiva PDKÎ hertim mifahwergirtina ji mafê paraştina rewşa bûye.

Komra Îslamiya Îranê bo dirêjahiya van çil salan siyaseteke ayînî wek ya DAÎŞ peyrewî kir û li ser berdewam bû, lê Dr. Qasimlo her ji destpêkê de bawerîya wî

ew bû ku têkelkirina siyasetê digel ayîn, dawîya wê şerekî hemû alî dibe, ku hemû herêmê bi xwe ve digre, û dibe ew rewşa ku îrorojê di Rojhilata Navîn de em dibînin. Em jî wekî Qasimlo çareserîya kêşên li Rojhilata Navîn de bi damalîna kincê ayînê ji siyaseta dizanin.

Eva ku Komra Îslamiya Îranê di van salan de bingeha wê danî, hikûmeta tirs, girtîgeh, îşkence, bidarvekirin, û bînpêkirina mafê jinan bû. Sedem jî diyar û zelal e, hikûmetek ku bawerîya wê bi demokrasî û mafê mirov nebe nikare bibe çavkaniya ewlekariyê, eva di demekê de ye ku Qasimlo bi dengê bilind hawar dikir ku çareserîya kêşeyan bi bexşîna hêz û qavetê bi civakê, û takên wê ye, da ku deshîlata serkutkar kontrol bike.

Yek ji binyatên sereke ên Komra Îslamî dijberî ye digel nîrxên civaka cîhanî, bo vê mebestê jî rojane Rojava wekî civakê dîr ji şariştaniyê û dîr ji mirovahiye nav dibe, heman eqliyet ku DAÎŞ jî hilgirê wê bû, lê dema ku em çav li jiyana û hizra Dr. Qasimlo dikin, xewnên wî li Rojava ser digirtin, û baştirîn dostên wî Ewropî bûn, û nîrx û buhayên Rojavayîyan wekî demokrasî, wekhevîyan jin û mêran û kultura pêkve jiyane, nîrx û bingeha ya jiyana takekesî û siyasî ya wî bûn, lewra hemû ew nîrx, heya îro rojê jî li cem Kurdên Rojhilat wateya xwe hene û nasnamebexş in.

Eva bo heyama çar dehikan dibe ku PDKÎ li dijî Komra Îslamî xebatê dike, sedem jî vedigere ser vê ku ew rejîm her wekî ku Dr. Qasimlo dibêje neteba ye digel cîhana azad û azadiyê de, lê dema ku em li siyaseta navdewletî dinîhêrin bo me êşkere dibe ku nerohniyek heye li tîgihîştin li hemberî Komra Îslamî de, ew jî vedigere ser vê cudahiya ku di navbera tundrewan û nermrewan heye di Îranê de. Di raştî de li



Îranê ew cudahiya nikare raşt be, jiber ku kêşeya bingeha di Îranê de, sîstemeke siyasî ye, sîstemek ku wek hindek ji rejîmê serdema şerê sar li ser bingeha îdeolojiya daxîstî û dugm û gelek paşkevî kar dike, ku karakterên siyasî ên wê fermanber in nek biryarder. Yê ku biryarder e Welîyê Feqîh e, û beyta rêberiyê û mafyaya serbazî û emniyetî a Spaha Pasdaran e. Lewra tu yek ji serkomar yan karbideştên din nikare karekî mezin bike. Wek Mihemed Xatemî bixwe ragehand ku ew tenê “tedarokçî” bûne.

Eva di demekê de ye ku li Ewropa û Amerîkayê hêştî babawerîya wan ya zal ewe ku dibe pêwendiyên xwe digel Îranê rabigrin, da ku renge ji vê riyê ve Komra Îslamiya Îranê vegeşandin ser hêla diyalogê, belku wekî deshîlateke normal digel wan û welatên cîran serederiyê bike, û her wekî ku çawa reformîstan di navxwe ya welat de nêzî 25 salan bi navê pêkanîna reforman pêngav bi pêngav di vê rejîmê de xelk han dane, bo parêzgarîkirina ji rejîmê, û mana di deshîlatê de, lê heya niha ew siyaseta çewtekarane tenê bûne sedema vê ku rejîm bi qazanca xwe mifahê ji wan wergire, û zêdexwaziya xwe pêk bîne, niha jî dunya şahid e ku siyaseta lihevkiyê digel rejîma Îranê bi hêviya pêkanîna reforman piştî çil salan deshîlatdariya vê rejîmê, ne tenê ew rejîm berew reformê ranekêşaye, belku roj bi roj zêdetir li ser pêşvebirina siyaseta û bernameyên xwe di navxwe ya welat û derve pêdagirî kiriye, di hember de piraniya xebatkarên Îranê di nava xaka Ewropa de hatin terorkirin,

»»»Doma R:4

ne li Amerîkayê, wateya wê ew e ku Komara Îslamî wek rehînekê digel Ewropa dilivlive. Lê tu carî baweriya bi pêwendiya stratejîk û domdirêj digel civaka navdewletî nebûye.

Bi giştî eva ku di dawiyê de dibe îşare pê bikim, ew e ku em wekî PDKÎ mîratgirê mirovên wekî Simko, Pêşewa û Qasimlo ne, mirovên ku bingeha baweriya bi cîhana azad û rizgariyê bo Kurdistanê bo me danîn, û di vê riyê de dehan carî ketin ber teror û zîndan û îşkence û awarebûnê. Lê zêdetir ji heft dehikan e ku hêşta jî em di vê riyê de pêngavan hildigrîn. Em di vir de kom bûne, da ku peymanê digel Dr. Qasimlo û ew hevalên wî ên şehîd nû bikin û bêjne wan, ku riya we kore nebûye, û berdewam

e, û pîrr rêvîng e. Herwisa em dixwazin bêjne Komara Îslamî jî, ku terorkirina wan kesayetiyên mezin û terorên din bi hawara we de nehatin, û ne tenê nekarîn dengê azadîxwaziya me bifetisînin, belku heya niha û piştî derbazbûna sî salan bi ser vê terorê re, rojane dengê mafxwazî ya gelê Kurd zêdetir bilind bûye, û bi eşkeretir ji her demê amade ne bo xebat li dijî we. Tenê tişta ku dikare me aram bike, rizgarî û azadî û rehetî û bextiyariya neteweyekê ye, ku daxwaza mafên xwe dike. Ew mafên ku bo hemû neteweyên cîhanê rewa ye, bo me jî wek netweya Kurd rewa ye.

Dawî gotina min rû li Kurdên dervey welat û awareyê destê zordariyê ew e ku, her wekî ku dizanin sê salan berî niha biryara “rasan”ê yan rabûneke din di Rojhilat me

ragehand, bila hûnên rêzdar baş bizanin ku hekî dilê me bi we germ neba, hekî me hûn wekî palpiştê xebatê nezanîba, xatirem bin ku zehmet bû di vê demê de biryardaneke wisa giran û girîng em bidin, lewra niha rûyê axavtina min li we ye ku çawa refa pêşmergeyên me, çawa refa xebatkarên bajar rojane xebatê li dijî dagîrker dikin, bi heman îradeyî hûn jî qada welatên Ewropî û Amerîkayê bikin çepereke din ji Rasana Rojhilat. Dema ku navê rabûna bêhempa ya we, me daniye “Rasana Tarawge”, wateya wê ew e ku şiyana îradeya we, bi radeya şiyana çiya û bajar, bo xebata Rojhilat girîng e, lewra wekî PDKÎ û civaka Rojhilata Navîn daxwaza me ewe ku piştqahîmtir ji caran tevî Rasanê bin, û hewl bidin ku tevî xebata şar û şax bin, li cîhana derve, jiber ku

rêberên me çend şehîd li ser vê baweriyê bûn ku erkek li ser milên me ye, hekî em vê erk û wezîfeya xwe bi başî cîbicî bikin, êdî nivşên din ên me dikarin bi azadî û rizgarî bijîn. Kurdistan û Kurd çavên wan li me ye.

Silav li Dr. Qasimlo û hevalên wî ên şehîd kak Ebdullah Qadirîazer û Fazil Resûl Silav li riha pak ya hemû şehîdên riya rizgariya Kurdistanê Silav li têkoşerên Rojhilat bo berdewamiya wan li ser xebata li dijî rejîma Komara Îslamî û bideştveanîna mafên xwe ên rewa.

Spas bo we xûşk û birayên hêja bo beşdariya we di vê bîranîna bicoş de.

Serkevtin bo me ye û neman bo rejîma Komara Îslamiya Îranê.

“Rasan Tarawge” di Ewropayê de bi rê ve çû

Kurdên Tarawge li 30`emîn Salroja şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî, civîneke berfireh li ber deriyê Parlîmana Ewropayê lidar xistin.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê li bajarê Biruksêlê Ragihand: “Îro Sêşeme rêketa 18`ê Pûşpera 1398 a rojî, Kurdên Tarawge, hejmarek li kesên siyasî ên Kurdistan a Îranê û bîhanî, hûnermend, nivîser, helbestvan û parek berçav xelkên din di Rasana Tarawge de amade bûn.

Armanca wê civînê, şermezarkirina terorîzma rejîma Îran û herwisa dosyaya terora Viyenê bînine gore. Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê ragihand: Ew civîne di Du parên sereke de pêkhatiye.

Para yekim a wê civînê di ber deriyê parlîmana Ewropayê bi rê ve çû ku, ew civîne bi wê awayî hate lidarxistin. Di destpêkê de beşdarbûyên wê civînê di ciheke diyarîkirî kom bûn. Piştê bi slogan û sirûd û herwisa heya cihê mebest, bi sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” rêketin.

Piştê sirûda bi sirûda “Ey Reqîb” û bi xwîndina helbestekê destpêkir. Piştê mamoşta “Hesen Şêweselî” endamê îftixarî yê Navenda siyasî a Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê, di wê civînê de peyamek pêşkêş kir.

Peyama desteya birêveber a wê civînê ji aliyê “Kamran Resûlî” berpirsê komîteya Hizba Demokrat li welatê Su`îsê pêşkêş kir.

Hevdem peyama Rêberayetiya Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê bi wê boneyê di wê civîna mezin de hate xwandin.

Piştê hûnermend “Necmedîn Xolamî” sirûdek pêşkêş kir. Di naveroka wê rêûresmê de peyama malbatên şehîdan pêşkêş kirin.

Piştê helbestek ji aliyê “Ehmed Şêrbegî” hate xwîndin.

Herwisa Hûnermend “Qadir Elyasî” çend ştran û sirûdek pêşkêş kir.

Peyama Yekîtiya Ciwanên Kurdistan a Îranê di wê civînê de hate pêşkêşkirin.

Di wê civînê de, çendîn Hizb û aliyên siyasî ên parên din ên Kurdistan bi wê boneyê peyamên xwe şandibûn. Piştê hûnermend “Mîka`îl”



sirûdek pêşkêş kir. Para yekim a wê bernamê wiha hate pêşkêşkirin. Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê di berdewamiya rapora xwe de basa wê kir ku, di para duhem a wê civînê de, civîn di yek ji salonên nêzikê parlîmana Ewropayê de bi rê ve çû ku wiha bû.

Ew civîne bi sirûda “Ey Reqîb” û sekîndandina bîstek bê dengî ji bo canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê Destpêkêkir.

Piştê peyama rêberiya Hizba Demokrat a Kurdistan a Îranê, bi zimanê Îngilîzî hate xwendin.

Di wê civînê de, kurte vîdiyoyek liser jiyan û hizra Dr. Qasimlo bi zimanê Kurdî û jêr nivîsa Îngilîzî nîşan dan. Di wê parê de, peyama vîdiyoyî a “Nersrîn Qasimlo” hevjiya Dr. Qasimlo û nivîsera pirtûka “Rehmanê Kurd” nîşan da.

Piştê Dr. “Frdîrêk Têso” hevalê nêzik ê Duktur Qasimlo di wê civînê de çend gotinek pêşkêş kir.

Piştê Senatorkî Biljîkî bi wê boneyê peyamek xwind, û hevdem peyama endam û parlîmanê Fêdral a biljîkî pêşkêş kir.

Di wê civînê de, hûnermend “Şivan Perwer” amade bû. Di wê civînê de, peyama serokê “UNPO” hate pêşkêşkirin.

Piştê di wê civînê de, parîzerê dosiya “Mîkonos” çend gotinek pêşkêş kir.

Di wê civînê de, peyama kongireya neteweyî ji aliyê “Zuber Aydar” hate pêşkêşkir.

Piştê hûnermend “Kawe Urmiye” sirûdek bi wê boneyê pêşkêş kir.

Di wê civînê de, Îraniyan payama xwe pêşkêş kirin.

Piştê hûnermend “Necmedîn Xolamî” sirûdek pêşkêş kir.

Di wê civînê de, peyama çendîn Senatorên Amerîkayî bi boneya 30`emîn salroja şehîdkirina Dr. Qasimlo nîşan dan.

Bername bi wê awayê dawî pê hat.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê daxûyaniyek belav kir



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران

Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.

مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Bi boneya 30 saliya terorkirina şehîd Dr. Qasimlo, Hizbên Kurdistanê Îranê, daxûyaniyek belav kir.

Daxûyanî wiha ye:

Sî sal berî niha, rêkveta (13`ê July a 1989`an), duktor "Ebdulrehman Qasimlo", Sekerterê Giştî ê Hizba Demokrat, yek ji rêberên xûya ê tevgera Kurd, di demekê de bo peydakirina rêyek bo çareseriya aştîxwazane bo pirs-girêka Kurd di Îranê de digel çend nûnerên hikûmeta Komara Îslamî li "Viyen" li ser maseya gotûbêjê rûniştibû, digel "Ebdullah Qadirî Azer", endamê komîteya Navendî û nûnerê Hizbê li Ewropayê, bi destê binav nûnerên dewlet bo gotûbêja aştîyê, hatine terorkirin.

Duktor Qasimlo li ser bingeha bawermendbûn bi çareseriya aştîyane a pirs Kurd, civîn digel dewleta Navendî bi awayekî rewa ya xebata Kurd û wekî pirsî-peke Demokratîk mêze dikir. Ebdulrehman Qasimlo, wek kesekî berpîrsiyar beranber bi çarenûsa neteweya xwe, her-tim wekî rêberê piragmatîk,

li çarçoveya bihevrebûn û dîyalogê pêngav diavêt, lê mixabin li ser maseya civînê, bersiva peyvên mirovahiyên wî, bi gulleyan dan.

Raste ku neyarên tevgera mafxwazane a xelkê Kurdistanê, karîn wî rêberê û rêberên din ên tevgera Kurd bi laş ji nav bibin, lê niha jî piştî 30 sal di ser terora Viyenê re derbas dibe, tevgera Kurdistanê li ser tekoşan bi merema mafên rewa ên xwe herwisa berdewam e, û li ser pê ye. Niha jî tevî vê ku deshelata siyasî li bajarê Taranê hertim hewil daye pirs Kurd ji dîtingeha ewlehiyê ve mêze bike û bo înkara wê bi berdewamî rêya tûndûtîjî û leşkerî digre pêşîya xwe, lê Hizb û aliyên siyasî yên Kurd û xelkên Kurdistan tevî rûbirûbûna rewa a çend alî, dîsan jî wisa dizanin ku di dawiyê de hemû pirs-girêk li ser maseya civînê çareser dikin.

Tevgera mafxwazî ya xelkê Kurdistanê Îranê, piştî derbasbûna 30 salan bi ser terorkirina şehîd Dr. Qasimlo re, qonaxên cud derbaz kirine. Ewa ku li hemûyan

girîngtir e, ewe ye ku, berevajiya hewla sîstema siyasî li Tehranê, ku hertim hewlil dide ji rêya tepesekirina tevgera xelkê Kurdistanê lawaz û bêdeng bike, niha xebata berfireh a gel bi awayekî medenî di gorê de ye. Ev xebate ku bingehê dadperwerî û neteweyî heye, bi awayekî serxwe bi tewahî reh û rise dadikute, û roj li pey rojê berfirehtir dibe. Esas û armanca wê xebatê ku nasnamexwazên neteweyî û hewldana bo vedîtina rêyekî bo çareserkirina demokratîk û yeksanxwazane ye, îsbatkirina wê raştîyê ne ku, siyaseta û dîtingeh û tekoşîna hizban, bandoreke kûr li ser wê civakê daniye.

Mixabin heya niha ew deshelata ku pîlana terorkirina Dr. Qasimlo û rêberên din ên tevgera xelkê Kurdistanê danîn, her bi dîtingehê emnîyetî mêzeyê tevgera neteweyî a xelkê Kurdistanê û daxwazkariya Hizban dike. Tevgera mafxwazên xelkên Kurdistan, ku baweriyeke kûr bi çespendina demokrasiyê li Îranê û çareseriya pirs-girêkan bi rêya aştîxwazane de heye, mixabin li heyama

çil salên derbasbûyî de, bi weşana ferman cîhadê bo ser xelkê Kurdistanê, terorkirina rêberên Kurd, tepesekirina maf û azadiyên xelkê Kurdistanê, Kurdistan di permanê de ragirtin, û bi êrîşa mûşekî û bombebarankirina binkeyên Hizban û bidarvekirina xortên wê, û bi siyaseta haşakirin li pirs neteweya Kurd di Îranê de, bersiva daxwazên wê daye.


Ji niha ve ku, civaka navneteweyî li ser pirs navkî û rêkvevtina "Bercam"ê li rûbirûbûn û givaşistina li ser wê rejîmê ye, em wekî hizb û aliyên Kurdistanî, tevî wê ku me eşkere ragihandiye ku, ev givaşane li ser rejîmê bi baş dizanin, û hevdem jî me gotiye ku, pirs-girêka me digel deshelata siyasî li Tehranê li ser maf û daxwazên me vedigere bo dehan salî berî niha. Mijara sereke ya me digel Tehranê, daxwazên neteweyî û mirovî yên me ne, ku di carnameya navneteweyî a mafê mirov de wekî "despêkîtirîn mafê mirovan" pejirandiye.

Di paşeroja welatê Îranê de, xwe bêdengkirina li ser yek ji daxwazên tevgera Kurd, û daxwazên mirovî û neteweyî ên me, ne tenê zirar bi piroseyê demokrasîzasiyona vî welatî digihîjîne, belku bi tewahî di qazanca aramî û bo pêşveçûna Îran nîne. Domkirina eqliyeta tewawxwaziya deshilatdarên Tehranê, rasteraşt û nerasteraşt paşeroja wî welatî ber bi komê senaryoyên nexûya ve dibe. Lewra hewce ye deshelat li Tehranê, bersiveke lojîkî bide daxwazên gelê Kurd li Kurdistanê Îranê, ku li bername û siyaseta aliyên siyasî de formole kirine.

Yad û bîra şehîd Dr. Qasimlo û tev şehîdên xebata mafxwazane ya gelê Kurd bilind be, û rê û rêbaza wan berdewam be.

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê 20`ê Pûşpera 1398`an – 11`ê Tîrmeha 2019`an

Nerîna Lîderan



Mîstefa Hicrî:

“Rojava li ser guhertina rejîmekê rijd e ku guhertinan li xwe nagire



“Donald Trump”:

“Me hewcehî bi lihevkiirineke sed sale digel Îranê heye.”



Jeremy Hunt:

“Me bi awayekî gelek bihêz bernamên xwe darêtine, bo bersivdan bi kiryarên Spaha Pasdaran derheq zevtkirina neftkêş a xwe”.



Mihemedcewad Zerîf:

“Amerîkayê li hemberî Îranê şikest xwariye”.

Azadiya jinan di bin siya rejîma Komara Îslamî de tenê xewn e!



N: Eskender Ce'iferî


Rewşa jinan di hemû serdeman de li welatên cuda, ji hev cuda bûye. Raşt e berî hatina Îslamê, çanda xelkê li Îranê cuda bû lê dîsa jî di gelek serdeman de jin raştî zulmê dihatin. Di serdema Îlamiyan de aştî herî zêde a serdestiya zilaman tê dîtin.

Mafê evîndariyê li cem keçan tine bû. Bav, dikarî rasteraşt ji keça xwe re hevjinêkî hilbijêre û pişt re keça wê, dibû milkê malbata zava. Hexamenîşyan, hinek rewşa jinan baştir kir. Êdî keç û jinan dikarî bibin xwediyên milk û malan û ji dayîk yan jî bavê xwe mîratan bigirin. Dîsa jî rê ji wan re nedihate dayîn da ku beşdarî çalakiyên civakê bibin. Heya niha ti kevîrîvîseke wê serdemê nehatiye dîtin ku wêneyê jinan li ser wê hebe. Li Text Cemşîda Farsan jî mînakek nayê dîtin ku mafê jinan, di wê serdemê de parastî be.

Di serdema Sasaniyan de, yekemîn jin ku karî di posta yekem a rêveberiya welat de cih bigire, Pûranduxt bû. Wê karî 1400 salan beriya niha, ji bo cara yekemîn behsa parastina kerameta jinan bike. Pûranduxt got ku Paşa eger jin be yan mîr, divê welatê xwe biparêze û wekhevîyê bicî bike. Ew gotara wê, weke gelaleyekê ji tevahiya fermanaran re hatibû şandin.

Ev rewş heya serdema Sefewî û Qacaran jî berdewam bû. Mafê jinan, tenê rêvebirina karûbarên malê bû. Jina ku di dema pêryoda mehane de bi zilamê xwe re razê, divê bê kuştin. Ev gotin ji tevdeştihildarên navçeyan re hatibû şandin û dihatê bicîkirin.

Yekemîn car piştî ku di 150 salên beriya niha de çalaki-



yên jinan di aştî cîhanî de deştê kirin, li Îranê jî di salên di navbera 1905'an de heta 1911'an jinan karîbûn beşdarî şoreşê bibin. Li Îranê di wan salan de civat û sazîyên veşartî ên jinan hatin avakirin û êdî ew li hemberî hikûmetê beşdarî meşên nerazîbûnê dibûn.

Jinan di wê serdemê de ji xwe re grûpên çekdarî ava kiribûn. Jina Lur bi navê Meryem Bextyarî bi çekdarên xwe re çû Tehranê û li hemberî Qezaqan şer kir. Lê tevî hemû kar û xebata wan, yasaya ku di wê şoreşê de hatibû pejirandin, mafên jinan binpê dikirin. Jinan jî weke tawanbaran, nedikarî di hilbijartinan de deng bidin.

Piştî hatina Rizaşayê Pehlewî, rewş hinek hate guhertin. Rizaşa di sala 1933'an de bi Mîstefa Kemal Paşa avakerê Komara Tirkiyê re hev dîtin kir. Rizaşa biryar da rewşa jinan baştir bike û azadiyê zêdetir bide wan. Yekemîn car bû ku li zanîngeha Tehranê, jinan jî dikarî weke xwendekar beşdarî korsên rojane bibin. Sala 1934'an fermana rakirina hicabê derket. Lê çapemeniyên jinan raştî givaşê hatin ji bo ku raştîya bûyerê nebêjin. Ev jî, ji xwe binpêkirina mafên jinan bû.

Xelkê, êdî li wî welatî rengê azadiya ol dîtibû lê dîsa jî nedikarî azadane hicabê bicî bikin. Eger karê wan bi siyasetê neketa, karê dewletê jî bi wan neketibû.

Serdemên herî zêrîn ji bo jinan li Kurdiştanê, dema şoreşa Simko, Konara Agirî û Komara Kurdiştanê bûn ku di wan serdeman de jin jî tevî

şoreşê bibûn. Piştî Pehlewîyan, şîeyan bi rêberiya Xumeynî serî hildan. Xumeynî ji sala 1979'an ve piştî ku hate ser kar, deşt daniye ser hemû navendên çandî. Êdî jinan nedikarî bê hicab ji malê derkevin. Wî got Îran welatekî Îslamî ye û ev dîn jî rê nade jinan ku bê hicab bigerin.

Ji wê demê ve heya niha hewlên cudakirina keç û xortan li zanîngehan hene û çendîn zanîngehan jî ev biryar bicî kiriye. Sala 2007'an beşdariya jinan li Îranê di çalakiyên civakê de ji 93 welatan pileya 87'an hebû. 2009'an Îran weke şeşemîn binpêkara mafên jinan hate binavkirin. Civata Cîhanî a Aboriyê ragihand ku Îran di nav 134 dewletan de ji bo bikaranîna jinan di postên girîng de ketiye pileya 128'an. Heya niha jî aştî dahata zilaman li wî welatî tevî rêjeya bilind a bêkarî û hejariyê, bi qasî nêzîkî sê caran ji a jinan zêdetir e. Gelek karên siyasî hene ku jin nikarin bi deşt bixînin. Ew herwisa nikarin bibin dadwer.

Gelek jin tenê ji ber rexnegirtin ji hicaba bi zorê tene girtin û raştî îşkenceyê tene. Jinek li Îranê ne dikare bibe serokkomar ne jî wezîra yek ji wezaretên girîng. Ew li wî welatî nikarin ji bo dîtina lîstikan jî derbasî nav stadyomên sporê bibin. Roja cîhanî a jinan li Îranê qet bi awayekî fermî nayê pêşwazîkirin. Ew kesên ku bi rengekî veşartî jî rêwresman di wê rojê de lidar dixin, ji aliyê sazîyên ewlehî ve raştî gefê tene. Roja jinan li Îranê tenê roja mirina Fatime keça pêxemberê Îslamê ye ku tede rêwresmên olî tene lidarxistin.

Îşkenceya girtiyan û serdana malbatên wan



N: Bûbê Eser

Gardiyan:

Rojên ziyaretê ji bona me karekî zehmet bû. De were girtiyan bibe û bîne. Ji serê sibê hetanî êvarê rûnenê. Me gelek caran bi rehetî firavîn nedixwar, em ji vê yekê gelekî hêrs dibûn û me hêrsa xwe di serê girtiyan de derdixist. Bi lêdan û îşkenceyên taybetî dixwest ku zîyaretçiyên girtiyan kêmbibin. Me dixwest ku girtî ji kesên xwe re bêjin bes werin.

Lê me çî kir û nekir em bi vê yekê bi ser neketin. Me li wan kesên ku zîyaretçiyên wan dihatin, dixistin û ji wan re digot: “ji bo çî zîyaretçiyên te tîn” û li wan kesên ku zîyaretçiyên wan nedihatîn jî dixist ku “çîma zîyaretçiyên te nayên”. Êdî girtî ji me zivêr bûbûn, wan jî êdî nedizanibû ku ew ê çî bikin. Ji ber ku me aciziyên xwe bi lêdana wan derbas dikir”.

Sîdarê girtî:

Rojek ji rojên zîyaretê bû. Ji xwe êdî em jî fêrî wê rojê bûbûn, ku ji aliyê gardiyanan de, em têra xwe û bi lêdaneke taybetî dihatin cezakirin. Ew aciz bûn ku “Çîma zîyaretçiyên me tîn”. Lê me jî dixwestin ku ew werin. Ji ber ku gardiyan wê rojê gelekî diwestiyan. Ji destpêka zîyaretê hetanî qedandinê, ew jî bi me re diçûn û dihatin.

Gelek caran jî ji ber deriyê qawîşê hetanî cihê zîyaretê li me siwar dibûn. Ji xwe ew tiştên ku ji me re dihatin gardiyanan yên bi kêrî wan dihat, ji xwe re dibirin, tiştên digîhandin me jî, ne bi awayekî saxlem bûn. Weke; Gomlek huştukira wan dihat çirandin, çakêt aştarê wan dihat derxistin û ...hwd.



Belê grûpa qawîşa me ya ewilî çûbûn zîyaretê, di vegerê de, li ber deriyê qawîşê, gardiyan got:

- Têkevin hundir. Hemûyan bi hev re weke elokan deng derxistin û gotin:

-Tu emir bike komûtanê me.

Piştî qederekê deng bi gardiyanê me ket û got:

-Ew kesên çûne zîyaretê û tiştên xwe negirtine, bila werin û bêjin. Bi qedandina wî hema hevalê Azîz ji nava me derket çû ber derî, berê silava bi nîga (lingan), dûre ya bi serî û dawî jî got:

-Azîz Mêrdîn emir bike komûtanê min. Piştî komûtê, Azîz domand: Komûtanê min! bavê min ji min re çeqmaq anîbû, lê ew çeqmaq ne di nava tiştên min de bû.

Ji me yekî weha bigota xelasiya me ji destê gardiyan tunebû. Ji ber ku bi vê gotinê gardiyan dibûn diz, ma gardiyan tucarî dîziyê dikin? Gelo gardiyan tucarî tiştên xerab dikin.(!) Na, na, lê îro hevalê Azîz, bi wendabûna çeqmaqê xwe ew kiribûn diz. Ev ji

bona gardiyanan kêmanî bûn, ma çawa dibe ku ew dîziyê bikin(!) Ma ev gotina hanê, wê çawa ji Azîz re bima. Loma gardiyan bi hêrs got:

-Baş e, derkeve derve.

Heval Azîz bawer dikir ku wê gardiyan çaqmaqê ku bavê wî, jê re aniye lê vegerîne. Derketina Azîz û tepe-repa lêdanê bû yek. Axî û qêrîn bi Azîz ket. Em, ew kesên di hundir de, me nedizanibûn ku êdî wê çî bê serî wî. Piştî lêdanê gardiyan rawestiya û got:

-Kurê min! çiyê te wenda bûye.

-Azîz Mardîn emir bike qomûtanê min, bavê min ji min re çaqmaq anîbû, lê min hîn ew negirtiye.

Di xelasbûna gotina wî de hema gardiyan çend kulmên din li wî xiştin. Dîsa bû tepe-repa wan (Ji dengê lêdanê em tégîhiştin ku ne tenê gardiyanê me li ber derî bû, bi wî re çendên din jî hebûn) li ser serê Azîz. Gardiyanê me bi zirt got:

-Kurê kerê, tu çawa me dikî

diz? Tu çawa ew Mehmetçikê ku namûsa we diparêzin dikî diz. Nexwe tu xayîn î, yanî tu dixwazî hemû Mehmetçikan diz bidî naskirin? Nexwe tu yî, yê mejiyê kesên nezan dişo.

Wan weha sûçê hevalê Azîz giran kirin ku ew bi xwe jî poşman bûbû, lê êdî tiştêk ji destê wî nedihat. Ev kiryarên wan ên weha ji bona ku kesên din nebêjin tiştê me wenda bûne, dihat kirin. Bi raştî jî ji wê rojê pê ve, çî tiştên me ku wenda bibana, me nediwêra bigota. Dûre gardiyan got:

-Nexwe te em hemû gardiyan kirin diz ha!

-Na, komûtanê min na, estex-furallah qesta min ne ew bû ku ez komûtanê xwe bikim diz, na haşa. Ew kesên namûsa me diparêzin, ma wê çawa tiştên me bidizin. Ne mumkun e ku ew tiştêkî weha bikin, dibe ku ketibe, dibe ku bavê min bi şaşî gotibe.

Bi lêdaneke baş, hevalê Azîz him bavê xwe derewçîn derxist û him jî ew çeqmaqê ku bavê wî ji wî re diyarî şandibû girt(!).

Bûyera kar, canê welatîyekî bajarê Bokanê stand

Kedkarekî xelkê bajarê Bokanê, bi sedema rûdawa kar di wî bajarî de, canê xwe ji deşt da.

Li gorî nûçeyê ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, di heyama çend roj berî niha, Kedkarekî Kurd ê xelkê bajarê Bokanê bi navê "Elî Rehîmî" kurê Mihemed, di dema kar kirinê de raştî rûdawa kar hat.

Ew Kedkarî Kurd, xelkê gundê "Yengêce" a girêdaya bajarê Bokanê, bi sedema ketin di avahiyeke bilind de, demûdeşt canê xwe jideşt da.

Di heyama 10 mehên sala 1397'an de, zêdetir li 1000 Kedkar di Îranê de, bi sedema kar canê xwe jideşt dane.

Li gorî amarên ku navenda



amara Ajansa Nûçegihaniya "kurdpa"yê tomarkiriye di sala 1397'an de, bi sedema bûyerên kar, 55 welatîyên Kurd bûne qurbaniya rûdawa kar û li serhev, 12 kes jî birîndar bûne.

Terha nexweşxaneyê bajarê Mehabadê nehatiye cîbicîkirin

Nexweşxaneyê "Teimînê Êctimaî" a bajarê Mehabadê ku Du sal berî niha terha wî ji aliyê wezîrê berê yê teawun û rifha êctimaî yê rejîmê ve hatibû pejirandin, heya niha jî ew terhe cîbicî nekirine.

Li gorî nûçeyên navxweyî yên belavbûyî, wezîrê berê yê teawun û rifha êctimaî Elî Rebi'î ku li serdana xwe a sala 1396'an a bo bajarê

Mehabadê, kilinga terha nexweşxaneyê "Teimînê Êctimaî" ji erdê xişt.

Qirar wisa bû ku ew terhe piştî çend rojan bê cîbicîkirin û peymankar mijûlê avedankirinê bin, lê heya niha piştî Du salan ew terhe nehatiye cîbicîkirin û tenê tabloya wî nexweşxaneyê xiştine erdê de.

Ewe Du salin xelkên bajarê

Mehabadê çavniherî wê terhe ne, lê berpîrsên rejîmê hemû demekê soz û qewlên wale û terhen bê bûdce dadirêjin û paşê jî bi hêncetên cuda wan terh û soz û qewlan cîbicî nakin û tenê di fikra berikên xwe de ne, û herwisa berpîrsên rejîmê tu girîngiyekê jî nadine bajarên Kurdiştanê.

Bajarê Mehabadê ku nêzî 200 hezar kes nifûzî ye, û xwediyê yek nexweşxaneyê ye, û piraniya xelkên wî bajarî bo tedaviyên pizîşkî bo nexweşxaneyên Urmîyê diçin.



Sê welatîyên Kurd ên bajarê Bokanê hatine desteserkirin

Sê welatîyên Kurd ên bajarê Bokanê, ji aliyê hêzên îtila'atê ve hatine gazîkirin û desteserkirine.

Li gorî rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Duşemî 17'ê Pûşperê, welatîyekî Kurd yê bi navê "Îbrahîm Merdanî" digel malbata xwe ji aliyê hêzên îtila'atê ve hatine desteserkirin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar,

hêzên îtila'atê piştî ku ew welatîyî Kurd desteserkiriye, deşt avêtine bi vekolîna mala navbirî, û deşt di ser hindik tiştên teke kesî ên navbirî de girtine û bi xwe re birine.

Herwisa wê çavkaniyê daye zanîn ku, "endamên malbata wî welatîyê Kurd, piştî lêkolînkirin hatine azadkirin".

Heya dema belavbûna wî nûçeyê, tu zaniyariyek der-

heg qedera navbirî ji ber deşt nîne.

Ji aliyekî din ve jî, di heyama rojên derbasbûyî de, Du welatîyên Kurd yên bi navên, "Es'ed û Yûnis" xelkên gundê "Qere Gol" a girêdayî bajarê Bokanê, bo îdareya îtila'ata wî bajarî hatine gazîkirin û lêkolîn ji wan hatiye kirin.

Çavkaniyeke agehdar daye zanîn, şepola nû a desteserkirina welatîyên Kurd li bajarê Bokanê, ji aliyê hêzên îtila'atê ve deşt pê kiriye.



Di bajarê Urmîyê de, 33 kes bi sedema madeyên hişber canê xwe ji deşt dane

Zêdeyê 30 kes li hevvelatîyên bajarê Urmîyê bi sedema madeyên hişber canê xwe ji deşt dane.

Berpîrsê hêzên leşkerî yê bajarê Urmîyê ragijhandiye: Di sala 1397'an de 33 kes li hevvelatîyên bajarê Urmîyê, bi sedema bikaranîna madeyên hişber canê xwe ji deşt dane.

Mes'ûd Xoremniya ku di

civîneke mediyayî de daye zanîn ku, di nava wan 33 hevvelatîyên ku bi sedema madeyên hişber canê xwe jideşt dane 32 ji wan mêr û digel jinekê bûne.

Li gorî amara Saziya pizîşkî ya yasaya Îranê ku li sala 1397'an, daye zanîn, 3 hezar û 672 kes di Îranê de bi sedema bikaranîna madeyên hişber canê xwe jideşt dane, û ew amare li gorî sala

1396'an ku 3 hezar û 56 kes bûye, 20% ji zêde kiriye.

Li gorî wê amarê rojane di Îranê de nêzî 11 kes bi sedema bikaranîna madeyên hişber canê xwe jides didin.

Li gorî amarên Navendên berevanîkirin li madeyên hişber di Îranê de, zêdeyê 1 milyon û 400 hezar kes ku raştî madeyên hişber hatine hene, û eve di demekê deye ku, amarên nefermî bas ji 4 milyon kesên ku raştî madeyên hişber hatine hene.



Mamoştayekî Tembûrvan çû ber dilovaniya xwe


Mamošta “Tahîr Yarweysî”, ji hûnermendên mezin ê Tembûrvan yê Dalahoyê, di temenê 79 saliyê de koça dawiyê kir.

“Tahîr Yarweysî”, mamosteyekî bê mînak yê binavûdengê mûsîqaya meqamî û oliya tembûrê xelkê bajarê Dalho a girêdayî parêzgeha Kirmaşanê, roja Sêşemî 25`ê Pûşperê, li nexweşxaneyê Bîsitun çû ber dilovaniya xwe.

Ew hûnermendî Kurd di warê lêdana tembûrê de

gihîştibû aştê ku di wê warê de binavûdengên cîhanê dihate hesabkirin û heya dema dawiyê jiyana xwe, li warê hûnera Kurdî û mûzîka Meqamî ya Yarsan, çalaki hebû.

Hûnermendî Yarsanî, “Tahîr Yarweysî”, di warê hûnera Kurdî de, xizmetek zaf kiriye û bi şîran û saza xwe, qutabxana mûzîka Kurdî xemilandiye û tevî hindê hejmarek zaf qutabî hîndê lêdana tembûrê kiriye, û di dehan festîvalên hûnerî yên cîhanê de beşdarî kiriye û bi sedan berhemên wî hene.



Tahîr Yarweysî, hûnermendekî emegdar, diloj û nîştimanperwer bû ku rêzek taybetî li devera Goran û parêzgeha Kirmaşanê û bi giştî di Kurdiştanê de hebû û karî di doma xebata hûneriya xwe de, zêdetir ji 70 Meqamên resen ên Kurdî ku di 700 salên derbasbûyî de hebûne, sing bi sing veguhaze bo nivşa nû û pêşî ji navçûna wan bigire.

Hêjano!



Bîst û pênc sal, hêj di wijdan de dijî
Namire, her dem, wê bi me re bijî
Geş Stêr bû, li nav asmanê Kurdiştan
Parêzer bû, bo felata me kurdan
Kar kir, bo Kurd, Faris û biratiyê
Deşt dirêj kir, bo selam û aştiyê

Sed mixabin, Ayetên Xwedênenas
Bi bêbextî, kuştin ev kurdê gernas.
Em jê didin, soz û peymanek dirêj
Bixebitin, dijî rejîma qirêj

Rêbaza wî bişpînin û her demê
Bi têkoşîn, li vê jîn û serdemê

Ta ku navê wî, bilind kin li welat
Û bibêjin; ew bû rêberê felat.

Bijîn kurdên, Kurdiştana Rojhilat
Yekî wek Qasimlo, ji nav we hilat

We pîroz dikim ji dil, hinav û can
Hûn bibîr tînin, lehengê qehreman.
Gelyê Qasimlo bilîlîn û biken!
Nevyê te ye, ev qehremanê resen.

Ji Qamişlo, bo we dikim diyarî
Zor sipas û silavan ji vî warî

Em jî wek we, Qasimlo bibîr tînin
Xweş silava, li vê yadê dişînin.

Bijîn kurdên, Kurdiştana Rojhilat
Yekî wek Qasimlo, ji nav we hilat.

H:Konê Reş


Rejîm çewtekariya di dîroka Kurden Xurasanê de dike

Di parêzgeha Xurasana Bakûr de tirkên girêdayî rejîmê bi weşana gotarekî, kultûra û dîroka Kurdan, bi navên xwe tewev dikin.

Li gorî nûçeyê ku gihîştîye malpera “Kurdiştanmedia”yê, Di bajarê Bêcnurd a girêdayî parêzgeha Xurasana Bakûrî de, tirkên bi weşana gotarekî ku bi navê “Kulyatî derbarê Turkanê Xurasan”, ku ji aliyê Mihemed Berzêger ve, hatiye nivîsandin, bi hemû awayekî çewtekariyan li dîrok û kultûra kurdî kirine û bi navê Tirkên dawî pê anîne.

Nivîskarê wê pirtûkê ji aliyê şaredarê Bêcnurdê Rûhîla Beratiyan ve hatiye piştevanîkirin, û di wê gotarê de, hewldane bi çewtekariyên xwe dîroka Kurdan bibne jêr pirsîyar, û herwisa serdarên Kurdan yên bi navên “Serdar Êvez Xan, Ceco Xan û Reşîd Xan” ku serdarên netirs ê Kurd bûne, di wê pirtûkê de bi Tirk dide nasakirin.

Navbirî bi weşana wê gotarê dixawze bi haşakirin li dîroka Kurdan di Xurasanê de, xweneran han bide daku bêjên mezintirîn dujminên Tirkên di Xurasanê de Kurdin, ewe dibe arîşeyeke mezin dinavbera Kurd û Tirkên di Xurasanê de, û ji aliyê din ve jî, rejîm di pîlan darêtinê xwe de serkevtî dibe.



Rejîma dîktatur û faşîst a Îranê, di heyama çend sale ku bi awayên cuda hewl dide daku Kurdan asmîl bike û dîroka Kurdan jînav bibe, û rejîm bi hemû awayekî piştevaniya wan nivîseran dike û tu berbestekê nîşan nade û pêşî ji wan hereketan nagre.

Her di vê pêwendiyê de, welatîyên Xurasanê ku her sal bo vebîranîna salroja helbestevanê Kurd, “Ce`ifer Qolî Zengilanî” ku helbestvanekî binav û deng ê Kurd ji bajarê Qoçan a girêdayî parêzgeha Xurasana Rezewî bû, welatî û helbestvanên Kurd li ser tirba wî bi awayên cuda kultûr û helbestên Kurdî nûdikirin, lê ji aliyê Wezaretê Îtîla`ata rejîmê ve hate daxistin, û îzin bi kesê nehate dan ku serdana tirba wî helbestvanê Kurd bikin, û her di vê derheqê de, çendîn çalakvanên Kurd deştêser kirin.

Zimanê Kurdî

Wek :

- Wiya hevaltiya min kiriye .
- Ez piştgiriya wiya dikim .
- Ma tu wiya dinasî ?

Diyar e ku ev bêje (wiya), ji (wî yê ha) kurtebir û pevxistî ye. Ev sivikbûn jî bi vî şeweyî pêk hatiye : - Cînavê nîşandan (wî) wekî xwe maye . - Zêdera (yê) hatiye avêtin : (wî...ha) . - Tîpa (h) ji (ha) yê hatiye avêtin : (wî... ..a). - Tîpa navbir (y) ketiye navbera (î, a) (wî-y-a). - Tîpa (î) ji (wî) sivik bûye : (wi-y-a) = (wiya)

5- Wêya (wêna) : Cînavê nîşandan (wêya), cînavê pevxistî ye, ji raweya (wê ya ha) sivik bûye. Ev cînav bo destnîşankirina navên mêzayên yekjimar bikar tê .

Wek :

- Wêya hevala xwe bir seyranê .
- Birayê wêya dostê min e .
- Mamoste xelatek da wêya .

Cînavê (wêya) jî, weku cînavê (wiya), bi wan pêngavan, ji (wê ya ha) hatiye kurtkirin û pevxistin. Ji hêleke dî jî, ev her dû cînavên nîşandan (wiya, wêya) bi şeweyê (wîna, wêna) jî, li hindê herêman bikar tên . Helbet ev her dû cînav jî (wîna, wêna) weku (wiya, wêya) ji van raweyên resen (wî yê ha, wê ya ha) sivik bûne, tenê li şûna (y) a navbir tîpa navbir (n), di (wîna, wêna) de bikar hatiye .

6- Wana : “Wana” jî cînavê nîşandan e, ji (wan ên ha) hatiye pevxistin . Ev cînav bo destnîşankirina navên komjimara her dû zayendan (nêr û mê) bikar tê : Wek :

- Wana alîkariya me kiribû .
- Me alîkariya wana nekir .

- Tu kê ji wana nas dikî ?

Di van mînakên de cînavê nîşandan (wan) bo komjamra nêr û mê bikar tê : - (Wana) = wan mîrên ha = wan ên ha .

= wan jinên ha = wan ên ha .

7- Viyalî (valî) : Diyar e ku ev bêje, bêjeyê lêkdayî e (hevedûdanî) ye, ji cînavê nîşandan (vî) û hevalkarê (alî) pêk hatiye. Bi vî yekê jî, gotina (viyalî)

wateya (vî rexî, vê hêlê) dide. Gelek caran bêjeya (viyalî) sivik dibe û bi raweya (valî) tê xebitandin . Bêguman bêjeya (viyalî) yan jî (valî) bo destnîşankirina cîgehekî nêz bikar tê . Anku, bi wateya (rexê nêz) tê xebitandin . Wek :

- Gelî hevalan, werin viyalî (valî) .
- Gundê me li viyalî (valî) çiyê ye . - Viyalî (valî) bajêr xweştir e .

8- Wiyalî (walî) : Ev gotin jî lêkdayî ye, ji cînavê nîşandan (wî) û hevalkarê cîgehî (alî) pêk hatiye. Reseniya vî bêjeya pevxistî ev e : (wî alî)

Wek :

- Ez li wiyalî dinêrim .
- Mala me li wiyalî pirê ye .

Bêjeya pevxistî (wiyalî) jî, bi şeweyekî gelêrî sivik bûye û bi lêvkirina (valî) tê xebitandin . Ev bêje bo nîşankirina cîgehekî dîr bikar tê . Anku, wateya (rexê dîr) dide . Wek :

- Mizgeft li walî bajêr e .
- Nêçîrvan çûne walî çiyê .

Têbînî : 1- Heger her dû bêje (viyalî, wiyalî) bi vî şeweyê pevxistî û sivikbûyî bikar bên, (î) ya her dû cînavan (vî, wî) dibe (î) û nîşandeka verêse (î) jî naghêje her dû bêjeyan Wek :

- Ez li viyalî (valî) bûm .
- Tu li wiyalî (walî) bûyî .

2- Lê ku her dû hêmanên wan bêjeyan (vî-alî, wî-alî) bi şeweyekî serbixwe (bêyî pevxistin) bikar bên, hingê (î) ya (vî, wî) wekî xwe dimîne û nîşandeka verêse (î) jî dighêje her dû bêjeyan . Wek :

- Ez li vî aliyî bûm .
- Tu li wî aliyî bûyî . 3- Alava tekezkirina nîşandanê (ha) li pey raweya pevxistî (viyalî, wiyalî) nayê xebitandin. Anku, nayê gotin : - Ez li viyalî (ha) bûm .

Lê ev alav li pey raweya resen (bêyî pevxistin) bikar tê : - Ez li vî aliyê ha bûm . - Tu li wî aliyê ha bûyî .

4- Ji wan têbînî, mînak û ravekirinan tê zanîn ku: a- Peyva (viyalî) ji (vî aliyî) hatiye pevxistin.

Dom heye...

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (354)

wêneyên “Rasana Tarawge”

